# DENGÊ KURD

12-11-Rêbendan 2712 k 1-2-2013 z DENGê KURD -hjmar (1) www. Pdksp.com

## Hawarhatina Barzanî Bi Rojavayê Kurdistanê Ve

## Erkekî Neteweyîye û Biryareke Dîrokîye

# Serê kanîyê

## Mizgînî

**nameya dengê kurd ji bo xwendevanên hêja : bi kurdî bi xwînin xwe têde bibînin**

Desteya nivîsgerîya dengê kurd mizgînîyê dide xwendevanên xwenî hêja bi derxistina çapa kurdî.

miletê kurd li seranserî kurdistanê bêpar maye ko bi zimanê xwenî petî û zelal bi xwîne, hemû hawe û şêwazên qedexekirinê ji bal dijminanve hatine bi karanîn, da ko kurd hînî zimanê xwe nebin, çi axaftin û çi nivîsandin û çi xwendin, da ko winda û tune bibin.

emê di dengê kurd de dergehekî serbest û firawan vekin li pêşîya xwendevanên xwenî hêja bi zimanekî petînaz li rêbaza şêwazekî nermenîşk û hêvîxwaz, bihilbijartina balkêştirîn û çêtirîn mijar û babetên ko hatine nivîsandin bi xweştirîn serdeq û bintar bi hûnandina rontirîn peyv û gotin û hevokên serfiraz. ziman nasnameye, ziman hebûne, ziman parastina neteweyê ye, ziman berxwedan û bergîrîye diber kesayetîya kurd neteweyê de di hemû serderm û rojgaran de.

**Desteya Nivîsgerîyê**



# Qewman
# û
# Taqîkirin


2 Sikritêrê Partî:emê dijî komerîşkên çekdar şerbikin

3 Komarxwazên Emrîkanî: Fîdralizm ji bo Rojavayê Kurdistanê çêtir Rêçareye

3 Turkîya û kêşedoza kurd li Rojavayê kurdistanê


## Rojavayê Kurdistanê di Gêjena Qeyranê de ye

# kêşedoza kurd li rojavayê kurdistanê (dubendî û daxwazî)

şêrzad Osman

Kêşedoza kurd li rojavayê kurdistanê ketiye rewşeke aloz û asoyeke berteng û çendîn xaçerêk liber vebûne jiber ko part û bendên têkilîdar zor û belavin , lewra ev pirhijmarîya rêkxistinî gelek kosp û nakokî derxistine gorepana sîyasî û milmilanek ji rikeberîyên coraûcor peydakirîye. ev alozî û qeyran di tevgera kurdî de li rojavayê kurdistanê kêşedoza kurd qels û lawaz kirîye licem (alî girê) erebî di dijberîya sûryayê de, jiber ko hîna liser kêşedoza kurdî ne rêkeftîne û gelek ji ewan dijberan ne di wê behweriyê de ne ko kêşedoza kurdî bin û binyad heye û (naxwazin) ko liser rawestin bi çavekî berpirsyar û nerîneke welatparêz. dêmekî em lirastî du gîrûgiriftên zirham rawestyane ka emê çibkin,? ka em çibkin başe? ji bo (çareserkirinê) çi di nava mala kurd de û çi di nava dijberîya sûryayê de. berya salekê û bêhtir du encûmenên kurdî hatin li darxistin ji bo (birêvebirina) têkoşîn û xebata kêşedoza kurdî li rojavayê kurdistanê dinava) şoreş û dijberîya sûrîyê de. ev têkoşîna rêkxistinî ji (destpêka) xwede alozî û ziyan gihandiye kêşedoza menî rewadar û (mafperwer) û bi dirêjahîya vê salê gelek dîdar, û civîn hatine bestin di navbera herdû encûmenan de û du hevpeyman hatine mohirkirin li hewlêrê bi serperiştiya serok mesûd



(Barzanî) lê mixabin ew hemû têkoşîn û hevpeyman û rêkeftin sar û deqşikestî mane û wisa hêvî û daxwzên miletê me jî çilmisîne. raman û nerînên bîrdozî li serdemê şoreş û cengande dest û pencên xwenî girj û dilreq nermenîşk dikin li himberî berjewendiyên welatparêzî ji ber ko dema kêşedoza kurd têk bi çe li gorepana sîyasî ewê (hemû) nerînên bîrdozî wê têk biçin dêmekî beramberiyek rasteqîne û berketî heya jê re tê gotin (berjewendiyên taybetmend xwe di çemînin li himberî berjewendiyên giştbend). tu carî (nayê te) pejirandin di cihana sîyasî de ko nakokî û tevliheviyên pirhijmarî berdewambikin ji ber ko derfet ya dakokî û hevgirtinê ye ne derfeta nakokî û rikberiyê ye û tu cari wekû evê derfetê bi destê miletê kurd nakeve ta ko mafên xwenî talankirî bi dest xwe ve bîne û destkeftên welat parêzî û (netew perwerî bi çespîne liser xaka xwenî pîroz û azad paşî ko qurbaniyan pêşkêşî azadiyê bike bi can û sinçîkî bîrawer û şoreşgêr. paşî ko tevgera menî kurd xwe berpirsyar bibîne li himberî kêşedoz û miletê xwe û xwe amade û tedarek bike ji bona têkoşîna rasteqîne û qurbaniyên maflibar û destbikar wê gavê di kare derbasî gorepana sîyasî bibe bi xurtî û serdestî û cihê xwe çêke di nava rêz û rêbendên şoreş û dijberîyê de çi li astê welatparêzî û çi li astê dorherêmî û navneteweyî. hîna derfet bervekiriye û şoreş (lidare û dijberiya rêkxistî ji derveye û hîna gelek kêşegirêk û nakokî bê) çare) û çareserîne û hîna jî (milmilan) û gîr û girift zor û zordestin. pêwîste ko tevger û milet pêngavên mukum bihavêjin ji ber ko kêşedoza kurd rewadar û maflibare nabe (tu carî) em xwe bispêrin nakokiyên navxoyî û hokarên navnetewî ji ber ko ev tênerîn û ponijîn têkçûna kêşedozêye û felaketek nû tête ( tomarkirin) di dîroka kurdî de, mixabinî û poşmanî wê gavê azar û birînan derman nakitin,ji ber ko derfet hatiye bûye gog divê bizanebûn û qurbanî em yefşa xwe lê bidin.?!!!

## Alîkarîyên Hawarhatinê (Dîyarîya Serok Barzanî)

**Seîd Omer**

**Dengê kurd çavnêriya vekirina buhurê (sêmalka) dikir dema derbasbûna alîkariyan.**

pêşengên alîkariyên hawarhatinê yên mirovatiyê ji bal serokê kurdistanê ve mesûd barzanî gehiştin buhurê (sêmalka) da ko derbasî wî aliyê sînor bibin ji bo bêne belavkirin liser akinciyên rojavaê kurdistanê ewkesêd ko hejar û belengaz û awarebûne ji ber nebûna pêdawîstiyan wek azoqe(ard- birinc- rûn- şekir) û sotemenî jiber bûyer û qewmanên şoreşa lidar li sûryayê, jêderê serokatiya herêmê tekezkir liser (miftî belaşbûna evan alîkariyan ji hemû pêkhatan re (kurd- ereb- xiristiyan). kûmîteyên hevbeş yên sazkirî ji herdû encûmenên kurdî li rojavayê kurdistanê hindek tedarekî amade kirbûn ji bona pêşwazîkirinê li kombariyên gihiştî wek xaniyên pêşçêkirî ji bo kargêriya komîteyên taybet(ewlekarî- peywendî- kargêrî- serperiştî-gumrik) û berhevkirina embaran ji bo ve hewandina azoqeyan û wisa hêla boriyeke taybet ji bo sotemeniyê hate dirêjkêşan liser çemê dicla bi firebûna (3) încan û mîtûrekî zirmezin ji aliyê herêma kurdistanê ve paşî peydakirina sehrîcên zirmezin (vehewîngîran). guhestin tekûz dibe bi rêka beleman gorepana buhur hatiye berhevkirin bi (şosa) û derbasgehên wî bi beldozeran ji bo çêkirina geracekê ji kemyon û bozingan re û vehesîngehên) wan di pêşerojê de û peydakirina bingeha kargêranê ji bo karkir û kadir û serpiriştyarên hêsankir ji kar re, ew alîkariyên hawarhatinê têne guhestin bi beleman liser ava dicle ji başûr biberû rojava de. endamê desteya karguzariya bilind (Hacî kalo) tekezkir û got: alîkariyên hawarhatinê gihiştin rojavaê kurdistanê û wê bêne belavkirin liser hemû pêkhatan (kurd-ereb-xiristiyan) miftîbelaş (da ko) kes bêpar nemîne ji van alîkariyan û daxuyanê û got: wê bilavkirin çê bibe liser ewan deverên ko ziyan û zirarî zor liwan hatiye wek (serê kaniyê- qamişlo- hesekê- til berek) her cihek li gorî zirarî û motaciyan.

## Turkîya û Kêşedoza Kurd li Rojavayê Kurdistanê

ciwan mîranî

Ev heye heyamek li turkîya basa çareseriya kêşedoza kurd dikin li rojavayê kurdistanê ji bal Erdogan û (AKP)êve lê ew çareserî neçû serî, nuha paşî berpabûna şoreşa sûryayê, turkîya xwe xistiye nava evê kêşedozê û liser ewan bûyer û qewmanan rastî du kêşegirêkan hatiye, yekem: bajarên rojavayê kurdistanê ketine bin zefta (PYK)ê. duwen: (PYD)ê bi xwe pabende bi (PKK)êve û turkîya pêwaye ko kêşedoza kurd li sûryayê çareser bike bişêweyekî aştyane ligel (PYK)ê, ev hewl û koşiş cihê tênerîn û sergêjiyê ye, ewê çawa kêşedoza kurd li sûryayê çareserbike bişêweyekî. aştyane ev bi xwe taqîkirineke giringe jê re, pirsyar ewe, gelo turkîya dikare bi ewê çareserîyê rabe ji ber ko liser xet û binxet (pkk)ê li himberî wê rawestiyaye, bê goman turkîya li rastî derfeteke dîrokî hatiye rawestan, divê berî hertiştî pirsgirêka di nav mala xwe de çareserbike tada ko karibe li dervê beşdarî çareseriyê bibe liser qad û zemînekî mukum û tebût çi li astê herêmî û çi li astê hevnetewî. kurd û hemû alîgirên dîtir çavdêriya reftarê turkyayê dikin ji ber ko ewê xwe îro roj kiriye pasevan û natorê rêrewê (sunnî) li deverê dijî desthilata rijêma (esed).





Adil Sedî

www.arsivakurd.org

Dengê Kurd -Nûçesazî

# Komarxwazên Emrîkî Hewldidin Bo Pêkanîna Fîdralîzmê ji Rojavyê Kurdistanê re

pirojeyeke hatiye amadekirin ji bal partiya komarî ya emrîkî, têde nerîna partiyê şirove dike sebaret bi cîgehê kurd li sûryayê li ber tîrêjên şoreşa lidar dijî rijêma esed dako ev piroje bête liser gengeşe kirin û biryardan li kongirêsê emrîkî. ev binçaxnameya navnîşan kirî ew nexşeya rêya kurdiye biberû fidralîzmê ve derbarê şiyanek lêhatî ji rewşa kurd re li sûryayê, di şiroveya xwe de dide xwyanê rewşa sûrye û sînaryoyên goman kirî diayînde de û di encamê de digihêje pêşînyara fidralîzmê wekû çêtirîn çareserî ji gîr û giriftên welat re paşî rûxana rijêma esed. binçaxname dibîne ko çareseriya fidralî li sûrya rêçareyek sitratîciye lêkhatê pêkanînêye bişêwazekî pêkpêkderî û ne yekser bi sedema rasthatina wî berambar dijberiyeke dirinde ji bal (erebên) ko wê, sawêvedin liser (îsraîla duwem) di fidraliyek kurdî de û wisa di gel dijberiya hêzên navherêmî de wek turkiya. binçaxname rawestanê, vedide liser jihevketina tevgera sîasîya kurd wekû yekem astenga goman kirî dijî pêkanîna çareserîya fidralî, li wê hêlê amaje dike biberû windabûna tevgera sîyasî di navbera sê alîgiran de çinko nikare tu daxwazê ji wan re ret bike û ew jî (hewlêr– silêmanî – qendîl) û digel wan de dijberiya erebî ji ber vê yekê tevgera kurdî dibîne ko bi dest xistina mafên rewşenbîrî û hevwelatînî sînaryokî çêtire xwedî derfetin xweştirin dema ko pirojeyê fidralî biterpile. binçaxname tîne, ziman belav kirina dîmoxrafîya kurd liser çend deverên cudacuda û dide xwuyanê ko hebûna fidralîzmeke kurdî tikîtenê ji çêtirîn çareseriyane û pêkanîna wê çarebere di navbera girêdana deverên kurdî de bişêwazekî tekcûgrafî. ev pirojeyê komarxwazî pêngavên pêwîst nîgar di ke ji bo pêkanîna fidralîzma kurdî ya ko çê dibe ji çar qûnaxan dibiko maweyê wan bigihêje bîst salan li gorî pêşveçûnên nav sûrî û navherêmî û navnetewyî, da ko têkeve berkêşana hûraviyên ew kiryara hestyar ji bo avakirina jêrxana fidralîzma kurdî û çawatîya li hevkirina kurd û hemû pêkhatên dîtir yên têkelûpêkelê wan li deverê wek (ereb-suryanaşûr) di çarçûveyê dîmûqratiyeke lêkvehatî bibe ji wan re misogerê beşdariyê di desthilata kargêrî de , û ev binçaxname amajeyê di de liser rola nifşê genc di avakirina civaka bajarî de di qunaxên serekî de ji pêkanîna pirojeyê fidralî ve. lê di qonaxêd lipêhatî binçaxname di axive liser bidestpêkirina karê rastûrast digel desthilata sûryayê guhêzkatî bo nivîsandina distûrekî lêkhatî digel jîwarê nîgarkirî digel miletekî xwedî mafekî siruştî bo biryardan liser çarenûsê wî ta ko bigihêje qonaxa dagerandina sazî û binyadên serekî biberû wezaretên ko xwe bi xwe kargêr bikin digel giringîpêdan liser cûrenazîya aborî û anîna veberhênanan li gorî yasayên taybet bi herêma kurdî ya fidralî re. lê qonaxa dawî ji pirojeyê fidralîzmê destpêdike bi nîgarê nexşeyan li gorî binçaxnameyên dîrokî yên berî cenga cîhaniya yekem û binyada dîmuxrafî ji deverê re û wisa liser ewan bingehan wê fidralîzma kurdî serast bibe.




jêder:KDP
: ferhengok
1-binçaxname:dikomênt 2- guhêzkatî: desthilata demdemî

# Sikritêrê Partî Eşkere Kir:



## eger komerîşkên çekdar ji serê kanîyê dernekevin emê likêleka çekdarên kurd şerbikin jib o derxistina wan bikotekî ji bajar.

serokê hevgirtina sîyasîya dîmuqrat d. hekîm beşar haydarîda û got: derbarê bûyerên serê kanîyê ez behtî mame çawa ewn komerîşkên kevneperest dadane ser bajar bihovane û da xw û yanê : (beşar esed li şamêye ne li serê kanîyê ye , lewra divê ew komerîşkana jibajar derkevin û berê xwe yekser bidin şamê , gava ko birastî dixwazin rijêma esed biroxînin) û wisa sikritêr dûkêş kir û got: me giftûgo digel dijberîya erebîya ya sûryayê re kir bivê taîbetkarîyê û wisa sikritêr peyvîna xwe berdewam kir û got: (eger ewan komerîşkan xwestin nêzîkî bajarên kurdnîşîn Bibin li rojavayê kurdistanê emê lihimberî wan rawestin jiber ko bajarênê kurdnîîn hêleke sore û mabûna ewan komerîşkên çekdar lideverê wê tevlehevîyek regezperistî çêbike dinavbera kurd û ereb de.



# Serê Kaniyê: Qewman û Taqîkirin

Lolo Xan

Qewmana serê kaniyê qewmaneke dîrokîye bi gulbijêrî hemû kurd berpirisyarin li pêşîya evê bûyera hestyar divan kawdanên dijwar û berteng de, ji şoreşa sûryayê re bigiştî ve û ji rojavayê kurdistanê re bitaybetî ve. komerîşkên çeteyên çekdar û palpiştên wanî navxoyî û navherêmî nedikarîbûn derbasî bajar bibana gava ko kurd -çi milet û çi tevger- berhev kirî û amadekirî bana ji berevanîyê re, ewan çeteyên regezperest newêrîbûn xwe bi havêjin nava bajêr û arê çek û top û tankan li xelkê bajêr bibarînin. şoreşa sûryayê gelek nihênî û rastî belûkirin û ko tevlihevî û pîlangêrîyên dijminan berdewamin çi li navxwe û çi li derdora welêt, ev şoreş şoreşa ezmûm û taqîkirinê ye ji hemû kes û alîgiran re, ji ber ko bûyer li pê bûyerê û qewman li dû qewmanê welatparêzîyê vedisûyîne û berjewendiyên diyar û veşartî dinirxîne li gorepana sîyasî û ew bi xwe jî wisa hatine nîşandan. qewmana serê kaniyê taqîkirine ji sê alîgirên berpirsyar re, yekem tevgera kurdî hatenasandin biqelsî û lawaziyê di navbera hemû rawestgehên şoreşê de û nemaze di warê jihevderxistina babetên pabend çi bi şoreşê ve careke, û bi dijberîyê ve careka din, û wisa encamdanên bûyeran têkçûn ji destê tevgerê ji ber ko pê şekîyên karû xebatê neron û eşkerane çi da nûstan bi bûyeran re bi xemsarî û çi tênerîn li şoreşê bipartîxwaziyek berteng ko xwediyê kêşedozê nagihîne tu çareseriyan, û serenrayî hemî wan derpêdanan sînorgîriya rêçareyên sîyasî, lewra rexnegirtin li kêmasiyan zor û belavin ji aliyê milet û rewşenbîran ve. tevger gelekî maye li paş bûyer û qewmanan dêmekî, hew di kare serencaman zeft bike da ko serkêşiya kêşedozê bike û wisa maye digergerînoka tengejeye de. 2-duwem: dijberiya sûryayê alîgirekî berpirisyare li pêşîya qewmana serê kaniyê ji ber ko ev qewman xelekeke ji rêzbenda bûyerên şoreşê ve lê mixabin evê di jberîyê xweda aliyê piştguhkirinê, dêmekî xuyanê dike ko destê wê bi tevahî di qewmanê de heye bi çi şêweyekî be. 3-sêyem: alîgirê sêyem ew pî langêriya navherêmiye, wa dî yare ko ew çeteyên regezperestên ko êrîşî serê kaniyê kirine hatine palpiştkirin ji bal turkîya ve û wisa xuyanê di be ko turkîya dixwaze sê çivîkan bi kevirekî bikuje û ewjî evin 1-derkêşana hêzên (YPG) ê bi berû gorepana şer û pevçûnan ve li himberî wan komerîşkên çekdar da ko (YPG)ê xwînverêj bike di navbera lawazbûn û tunebûnê de. 2-vêxistina şerekî netewxwazî di navbera kurd û ereb de, da ko kêşedoza kurd li rojavayê kurdistanê biser nekeve. 3-destêwerdana leşkerî ji bal supayê turkî ve da ko derbasî rojava bi be bi behaneya (be lavkirina) tenahiyê û (seqamgîriyê) ji bo ewlekarîya sînor û deverê. li dûmahîkê qewmana serê kaniyê dimîne waneyeke dîrokî ji tevgera kurdî re da ko reftara xwe rexne bi ke û xebata xwe binirxîne di terazûya taqîkirinê de ji ber ko hîna em kurd di destpêka rêname û rêkaran dene.

www.arsivakurd.org

# Ciwan Haco
## Elboma (Veger) Derdixîne



Dengê Kurd -Nûçesazî

**H**unermendê kurd ciwan haco elbomeke nû ji sitranan derdixîne bi navê (veger) ev elbom dinava xwede (11) sitranan vedhewîne, hindek jiwan sitranan kevnin lê hunermend haco şêwaz û pergalekî nû daye van sitranan û nemaze nûjengkirina saz û wazên dabeşkirina mûzîkê, û jiwan sitranan (canê – li warê jînê – emîne) digel sitrana nemir mihemed şêxo (eman dilo).

berî çendakî ciwan haco hatibû başûrê kurdistanê serîdabû çadirgeha (dûmîz) ya penaberên rojavayê kurdistanê û çend aheng liwêderê gêrabûn )jibona piştgîrîyê û hildana hêrs û arîjenan licem penaberan. paşî heyamekî nêzîk ciwan haco digel çend hunermendên kurd yên navdar dirêya vîdyo de nameyek hinartin ji şoreşa sûryayê re têde piştgîrîya xwe jêre danxuyanê û têde daxwaza azadî û dadmendî û dîmukrasî û aştî û heskirinê kirin.

## şer û pevçûn li serê kaniyê berdewamin

Dengê Kurd -Nûçesazî

çalakvanên serbixwe şer û pevçûnan dişopînin çi liderdora bajêr û çi dinava taxên wî de, komerîşkên çekdar serê kaniyê dane ber topbaranê û wisa gêranek berfireh peydabûye liseranserî bajêr û gelek qurbanî hatine belavkirin li kolan û gorepanên cuda cuda li bajêr û wisa koçberîya akincîyan destpêkiriye paşî belavkirina tirsaneke dijwar di hinavêd wan de, û rabûna ewan çeteyan bi kiryarên talan û ferhûdê ji samanên wan re, û di nava qurbanîyan de gelek pîr û kal û zarok peyda bûne û heya(orxanê dehbelor) ji bûye armanca guleyan segvanekî çeteyan. çalakvanên kurd tekezkirin: kopiraniya xortên serê kaniyê ketine bereya şer û pevçûnan û bajarê xwe diparêzin ji komerîşkên çeteyan lê di nava rewşeke zor tengezar de jinebûna av û karuba û nan û ragihandinan. çalakvanên kurd dûkêşkirin: (komerîşkên çeteyan termên kuştîyên xwe li qada şer dihêlin û dibezin derveyî bajêr digel gûrbûna dorpêçanê linavenda bajêr.



serê kaniyê

# Birîna Jiyanê

Dengê Kurd -Nûçesazî



lawkê haci

**L**awikê hacî helbestvan û rojnamevanekî çalake xwedî deshel û vîyanek serbest û serkêşe. li serê kanîyê (waşo kanî) li rojavaê kurdistanê ji daiyek bûye sala 1968, di jiyana xwede gelek êş û azar û zînat dîtine, tûşî astengî û kosp û qedexekirinê bûye di kar û xebata xwenî siyasî û rewşenbîrî de, nave wî derketiye gorepana rewşenbîriyê di(10) ê nîsana sala 1995an de bi damezrandina (cejna zaroka kurd). berhemê wînî dawî (birîna jiyanê) hatiye çap kirin di destpêka sala 2013an de, naveroka evê pertûkê wiha hatiye xuyanê kirin ji bal lawik ve (rûdanin kurdan li nav xaka Kurdistan ji ser demê gotiyan ta şoreşa barzan). lawik bi bilbilê xwere diaxive di destpêka dîwanê de û dibêje: bilbilê min dengê te pir naz û bi jane bilbilê min tu dixwîne liser gulane ji bîrneke ev dilê min derya xemane hêviya min rizgar bibin ji bindestane piştî lavija lawik bi bilbil re dice warê rewşa miletê kurd û kêşedoza wînî rewa û zoranbazî li ser kurdistanê ji bal dijminên hawîrdor. piştî şirovekirina bindestî û hejarî û perîşaniya miletê kurd di serdemê nû de diçe dîroka kûr û dûr lawik dibêje: bi bîrtînim lolo bûm û gotî ji kurdan di dîrokê li rojhilat dengdane cîhan bûn xudiyên hêzên mezin sera û eywan bi hevre wan destdanîn ser welatê halman û bi vî awayî helbestvan navê bavik û hoz û dewlet û mîrnişînên kurd dûrêzî hevdike ta îro roj bi zimanekî sade û zelal. hêjayê gotinê yê ko ev beşê yekeme ji pertûkê.




Dengê Kurd -Nûçesazî

## Hêviyek Biçûk û Guleyek

**pişkûrîna pêşangeha hunermendê kurd, nîgarkêş luqman ehmed li waşintunê.** hunermendekî kurd ji rojavayê kurdistanê bitiliyên xwe dîlokên şoreşa sûryayê nîgar di ke dirêka zimanê reng û wêneyan ewên ko di axivin liser çîrokên gel û bajar û gund û kevok û çivîkên ko li azadiyê digerin bê dilkêşî li rawestgehên mirin û sitem û zindanan, bê tirs ji serma zivistanê û şerqîniyên bahozê, radihêjin xewn û dengêd xwe, ewên ko hildikşin asman bêjivan, şoreş û nan û xwîn û xurme û zeytûn û simbul û yasimîn, evin neînykên şoreşa azadî û rûmeta sûryayê ne. wekû jitivingê re deng û peyam heye, ji rewşenbîrê re jî deng û peyam heye ewên ko dibînin şêwazê aştiyane pîro zmendeke û zimaneke di be ko şoreşgêr di rûyê sitem û hêzên tariyê de ko welat û raman û dîrok û civakên xwe rizgar bikin ji rewşenbîriyên tarî û girtîgehên xw edawendên xweser ve.



Luqman Ehmad



## Milyardêrekî Kurd
## Dijberiya SûryAyê Haydar Dike



Yehya Kurdi

**Y**ehya kurdî milyardêrê kurd, endamê hevbendiya hêzên dijberiyê û şoreşa sûryayê ji qalikê kerbûnê derket û eşkerekir û got: (ez kurdim heta mejiyê hestî diser ko ez sûrîme, ez rê nad im ko xwîn bêhtir bê rijandin li serê kaniyê û divê ev pêtenazî raweste ji ber ko ew xizmeta rijêmê tenê di ke ) û wisa milyardêr peyvîna xwe dûkêşkir û got: ez hêzên çekdar haydar dikim di berdewam bûna topbaran kirina serê kaniyê de û wisa jî hêzên dijberîyê ji ber .vî helwêstê serpêl derbarê rewşa serê kaniyê û wisa milyardêr amajekir: (sûdmendê yekem ji bûyeran rijêma esede digel çend komerîşkên çekdar de ewên ko serê kanyê ji xwe re kirine lêswarî da ko pirojeyên finasok bişopînin dijî kêşedoza kurd li sûrya yê û ew karên leşkerî ji bal ewan komerîşkan ve nayên pejirandin diser ko ew dibêjin ew ji sûpayê azadin jiber (ko serê kanyê tu girngiya wênî leşkerî nîne

Dengê Kurd -Nûçesazî

www.arsivakurd.org